STOP !

Kurdên Rojavayî Kurdistanê ne bê xwedîne!

Demhat Dêrikî

Sala 2008-ê bû sala berxwedana gelê kurd! Kardistan û her parçeke xwe li gor merc û derfetên tê de ne, di vê salê de bû qada berxwedana bi rûmet. Newroza evsal ev rastî destnîşan kir. Di dîroka gelê kurd de ev cara yekêye ku hemû kurd dibin yek deng û diherikin kolan û bajaran û xwedî li xwe derdikevin, çi li bakur, çi li başûr û çi li rojavayê Kurdistanê, miletê kurd li hember neyaran bi dengekî bilind mafê xwe anîn ziman. Bê guman, nivîskar û ragehandina kurdî jî bûne yek helwîst û bi pênûs û zimanê xwe tev li vê berxwedanê bûn.

Lê, li rojvayê Kurdistanê rewş cuda bû. Miletê rojava li dijî hemû astengiyên dagirkerê artêşa Baas, xwedî li Newroza xwe derket. Xwedîderketina li cejna netewî jî, zanîn, biryar, vîn, bawerî û girêdana bi dozê ye. Raste, kolanên bajêrê Qamişlo, Dêrîk, Efrîn, Kobanê, li Heleb, Şamê û li hemû bajêrokên Kurdistana rojava Newroz bi serbilindî hate pîrozkirin. Ev tê wateya di nav mercên herî tund û dijwar de, hêza xwedîderketina li rojavaye. Li gorî dîtina min. Miletê vî parçeyî serok û rêberê xwe xwe ye. Ango li rojava û li gor merc û derfetên heyî. Milet gihaye wê astê ku xwedî li rûmeta xwe derkeve! Û li gor pêşketinên siyasî ku li ser asta deverê pêk dihên. Û li qunaxên dahatû, ev rastiyê di têkoşîna gel de diyar dike.

Kurdên rojavayê Kurdistanê ne bê xwedîne weke hindek dibêjin. Xwedî derketina serokê herêma Kurdistanê rêzdar Mesûd Barzanî li rojvayê Kurdistanê pir bi giringe û xwedî wateyeke bilinde. Bêguman, divê mirov rewşe siyasî ya herêma Kurdistanê jî deyne ber çav û vê axaftinê şîrove bike. Piraniya partiyên kurdan bûne piştji kurdên rojava re û gotin, ji bilî mafê kurdan em tiştekî din napejrînin. Ji aliyekî din ve têkoşîna xwe ya aştiyane berdewam dikin.

Ez di wê baweiyê de me ku kanî di dema xwe de diteqin û av jê diherike, ango kurdên rojava di zanabûna bizava xwe de ne û yê mifayê ji nakokiyên di nava Suriyê û ji derveyî Suriyê bibînin û ev bêhn hêdî hêdî derdikeve, bi kurt û kurmancî. Gelê rojava xwediyê xwe ye.